Nowadays my birds are imprisoned in the cage of my chest. As I lack speech. I try to feed them with my soliloquy. Yet this doesn't satisfy them, and they desire to arise through my mouth and flutter outwards. When at last I cannot afford them this, they huddle in my bosom, crashing into each other, making my lungs and heart bleed. To lack speech is to be a prisoner. The bondage of the winged words and the birds of dreams...

Saet 21.23

(Kurdish)

Kampa penaberan a ku ji bendîxaneyê hatiye avakirin: BIJLMERBAJES

Êvareke ewrî ye û warê ku ez tê de diminîm rojên min ên zindanê tînine bîra min. Ji ber ku ev qampa ku ez tê de me, wextekî berê wek zindan/ girtîgeh hatiye bi kar anîn. Ji bo me çî zore ku -her waha çî zordariye- avahîsaziya vê derê wek berê parastine. Wekî mînak, di odan de deriyê hesin da ku ji paşve nayê kilîdkirin hene. Giranî û acizkirina wê tiştê encax kesên ku bi demdirêjî li girtîgehê mabin dizanin. Dîsa hin jinên ku tenê dijîn û xwe di nav ewlehiyê de nabînin wê fehm bikin. Bi boyaxên çilmisandî diwarên odeyan hatiye boyaxkirin û paceyên di odeyan de nayê vekirin. Li ser de ew caxên hesinî ku di wexta ev der girtîgeh bûye hatî çêkirin hîna jî diskine. Wek dibêjin ku "tu li vê derê li bin kilîtê de yî û ne mimkûne ku tu jî vê derê derkevî" Qey ewqas tişt ne besin ku li ser de hertim alarma cixarê lêdixe. Dengêkî bihêwirze û kampax!...Ne kêm û ne zêde ev der tam girtîgeh e. Warekî ji bo pêkûtiya li ser derûniyê ye.

Gelo çî hatiye hizirandin û li ser çî armancê vê warê ji penaberan re vekirine? Gelo ev berhemekî hişmendiya rojavayî ye? Di aliyekî de pesnên demokrasîyên xwe didin û aliyekî din jî çîncînî bûnê wek çandekî dihesibînin. Gelo derheqên penaberan de wek "van kesên ku hatine ji sinifê duyemin û ji desten despotan, ji şer û xizaniyê reviyane. Ji bo vê jî dikarin li her warê bijîn" difikirin. Bi kîjan aqil û armancê ev cîh û war tê bi kar anîn? Gelo hê jî mededê wan ji hişmendiya "îsleh kirinê" heye? Da ku di wextê de li ser vê zîhniyetê girtîgehan ava kiribûn. Dibe ku penaberan wek potansiyelên sûc bibînin û bixwazin wan îsleh bikin? Naxwazim ku nîrxandinên bê heq bikim û bi nêrînekî yek alî bigehêjim encamê. Lê di bin biryara cîhkirina penaberan de tu aqlekî erênî nabînim.

Êvarekî bi ewr e û rojên kevn ku min li girtîgehê derbas dikir tînin li ber çavên min. Ji wan deman ev gotin tînin ber zimanê min:

Ev êvar xerîb e ji min re û li ba min nînin hezkiriyên min.

Baran bibare jî dibe û nebare jî...

Ne ezê bigehêjim tama şilbûyîne û ne jî ezê germ bibim li bin dengên ewran bi hembêzkirina hezkiriyên re.

Ewr vede jî dibe venede jî...

the time is 21:23

From Prison to Refugee Camp: BIJLMERBAJES

It is a cloudy evening, and the place where I am currently staying reminds me of my old days in prison. Because the refugee camp where I am staying was once used as a prison. And how hurtful and cruel it is that its architecture was left much the same as it was in the past. For instance, it has iron gates that cannot be locked from the inside. Only the lonely women who were imprisoned for a long time and do not feel safe and secure anywhere can have a grasp of its heaviness and discomfort. It has pale walls and windows that cannot be opened. Moreover, the iron bars outside the windows also remain as in the past. This place gives you the feeling that you are under the lock and key and that you will never be able to go outside. And to top it all, there is the smoke alarm device that is always emitting a terrible noise and going off unnecessarily. A prison in every respect! A field for psychological oppression.

What are they aspiring to achieve by putting the refugees in these places? Is it a product of a Western understanding that outwardly praises democracy while transforming itself into a classist culture? Are they thinking like, "Somehow or other, these are second-class people that have escaped from wars, tyrants and poverty, so they can live anywhere"? Why on earth are these places being used and for what purpose? Or do they appeal to the sense of "chastening" of the ones who had built these prisons once upon a time? Do they see the refugees as potential criminals and aim at chastening them in these places? I don't want to be unjust and one-sided in trying to understand it, but I find it very difficult to see the goodness in placing people in here.

It is a cloudy evening and my old prison days are flashing before my eyes. Words from those days are coming back to me:

Tonight is a stranger to me and my beloved ones are not at my side.

It doesn't matter whether it rains or not...

I will neither be able to enjoy getting wet nor get wet together with my beloved ones who would hug me below the thunder and lightning.

It doesn't matter whether lightning strikes or not...

Ji paceya odeya xwe ve, li balafirên dadikevin ber bi jêr ve dinêrim. Ji pênuşa min gotinên ne zelal -lê bi piranî dişibin hev- diherikin:

Balafir dadikevin li ser milê min  
Dipelişim.  
Qirçe qirça qefesa singê min e  
Xwîn dibim.  
Ne ji welatê min silavan tînin û ne jî silavên min ji welêt re dibin...  
Mîna ku ejderhayê hesin, dadikeve li ser min  
Dişewitim.  
Hesreta min ji çavên min dipijiqe  
Şil dibim.

the time is 19:02

Through the window of my room, sometimes I watch the aircrafts descending for landing. These sentences, sometimes vague, sometimes precise, but always akin to each other, are flowing from my pen:

Aircrafts are landing on my shoulders, I am collapsing.  
My chest is crackling and I am bleeding.  
They are landing without bringing any greetings from my homeland, and without delivering my greetings to my homeland...  
As if some iron dragons are descending on me  
I am bursting into flames  
My yearning is welling out from my eyes  
I am getting soaked

Sekinîn an jî li hêvî mayîn, paşveçûyîn e...

Ji yek eziyeta heri mezin ewe ku di nav nezalaliyê de sekin an jî bê hêvî mayîn e. Bê dîtîn û nezaniya derheqê pêşerojê de mirov, hertim bi pirsan re dijî. Pirsên mejîxwar. "Wê çi bibe? Çima? Wê heya ku derê ezê bisekinim? Û bi vî şeklê gelek pirs... Ji bo vê yekê, li bin ewrên diherikin de sekinîn, di rastiya xwe de paşveçûyîn e.

To wait is to regress...

One of the biggest forms of suffering is to wait in uncertainty. A person dwelling in obscurity without foreseeing the future constantly lives with mind-gnawing questions. Questions such as, "What is going to happen? When? Until when do I have to wait?" and many more... This is why to wait while the clouds stream over you is, in fact, to regress...

Duh êvarê jinekî Hollendî ji min pirsîyar kir: "Gelo ez dikarim ji te cixarekî bigirim"? Min got "belê fermo" û min pakêta cixara xwe dirêjê jinikê kir. Carekî din jî pirs kir û got: "Hevala min jî heye, gelo ez dikarim ji wî re jî libek bigirim". Wateya dirêjkirina pakêtê ew bû jixwe, yanê tu çiqas dixwazî dikarî hildî, lê jinikê vê fêhm nekîr. Ji bo vê jî min got "helbet tu dikarî ji hevala xwe re jî bigirî" Jinika ciwan, piştê ku cixaran girt, destê xwe avête cizdana xwe û ji min re got: "Ez dixwazim van cixaran ji we bikirim, kerema xwe re bêjin ka çiqas hûn pere dixwazin? Wek ava cemidî li serê min bikin, ez di cih de mam û bi sedema mit mayîna xwe, min nizanî bû ku ez çi bêjim. Dema hinek min xwe kom kir, bersiva jinikê da û min got: "Ez ji bo tiştêkî wiha pere nagirim. Ez Kurdîm û li gor çanda me ji bo tiştên wiha bê qîmet pere nayê xwestin û her wiha parvekirin kêfxweşî dide me" Beranberê bersiva min îca wê jî bi rewşek ecêb mayî li min mêzekir. Wek kesên ku şahidiya pir tiştêk ecêb bike dixûya. Herhal li gor wê, ez pir balkêş tevdiageriyam. Lê li gor min jî xwesteka wê pir ecêb bû. Ji me kê normal bû û kê ecêb?

Min şeva xwe hemû bi hizrandin û ji xwe pirsîna van suala derbaz kir. Piştê van nîqaş û pirsan, ez dikarim bêjim ku di derheqê du mijaran de zelal bûm. Mijara yekem ewe ku min carekî din jî ji çanda xwe hez kir. Li gor çanda me parvekirin, şanazî dide mirov û her wiha mirov kêfxweş û hêzdar dibe. Wisa dibêjim lê tu kes, ji bo şanaz be an jî xwediyê hêz be vê tiştê nake. Parvekirin, ji dil tê û her wiha parvekirin, wek peywirekî xweza tê hesibandin. Ew kesên ku yek jê cixare û nan bixwaze û bi wê re parve neke an jî deriyê xwe ji mêvanan re veneke, wek şermekî û bi nelet tê dîtîn. Helbet ku bi derbasbûna demê ve di çanda me de jî hîn guhertin û bişavtin çêbû û nexweşiya takekesî derbasê erdnigariya me jî bû, lê dîsa jî bi taybetî herêmê me yên çiyayî û gundan de ev çand tiptîk li ser pê disekine û hêzdar e. Ez kêfxweşim ku vê çandê dihewînim û ez tu car xweşbûna vê çandê bernadim. Hasilî kalam sedema pere nestendina min ji çanda min bû û li

gor min ev tevgerekî pir rast bû. Ez encex di yek alî de dikarim maf bidim jinikê û perê wê qebug bikim. Di axa me de azadiya aborî ya jinan li gor me mêran kêmtir e. Bi rastî ev pirsgirêk, di her derê cihanê de li rastê jinan tê. Eger ku hevalemî min ya jin, bixebite û bixwaze ku perê tiştê ku me xwarî an jî vexwarî bide, helbet ezê wê qebug bikim. Mafê wan heye ku vê kêfxweşiyê jiyana kin. Her wiha parvekirin, di xwezaya jinan de heye û di vê mijarê de jî ji me/mêran pir pêştir in. Dema ez di vî alî de ew jina ku xwest ji min cixare bikire dinêrim, maf didim wê. Eger ku mesele azadiya aborî ya jinikê be û bi vê şeklê xwe wek bihêz hîs kiribe, ev tiştêkî bi qiymet e.

Lê ev mesele çûda bû. Li gor min ew tiştê ku min jiyana kir an jî şahid bûm, encamê û berhemên kodên çandî û hişmendî ya bicîhbûyî bû. Ewrûpa, dibe ku di mijara ferdîtî û azadiya şexsî de li gor herêmên din pêştir be. Lê ferdîtî ya girêdayê madiyat, bi demê de qutbûyîna ji civakê û tenêbûnê derdixe hole. Mirov, di nav çerxa aborî de wek êsîr tên girtin. Ew fikra ku -eger perê te tune be tu nikarî jiyana xwe berdewam bikî- bi herkesê ve tê deqandin û herkes jî mecbûr dimîne ku jiyana xwe li derdora peran ava bike û her wiha emrê xwe bi vî şiklê biqedîne. Kapîtalîzm, li her deverê cihanê zîhniyetekî ku di navenda wî de dirav heye derdixe pêş. Û her wiha gelek deverên cihanê de mirov, êdî rastiya vî pergalê hêdî hêdî ferq dikan. Lê qasê ku ez dibînim, li Ewrûpayê ev rewş hatî qebugkirin û bûye çandekî bicîhbûyî. Wekî mînak, li Swiss rastê min hatibû; Gelek kal û pîr mîratên xwe ji zarok an jî ji xizmên xwe re nedihîştin, mîratên xwe ji dewleta wê derê re dihîştin. Herhal li gor xwe wisa dihizirin ku; dewlet, li ser her tiştê ye û wê li zarokên wan jî binêre. Ji bo vê jî pêmayînên xwe bi tu kesî re parve nedikirin. Hecku dewlet, ji zarokên wan ve fikra: “Bixebitin, ew perên ku hûn qezenc dikan biparêzin û bi tu kesî re parve nekin. Eger hûn parve bikin hûnê birçî bimînin” empoze dike û wan bi vî şiklê mezin dikan. Û zarok emrê xwe bi kar derbas dikan û her wiha perê ku qezenc dikan jî bi tu kesî re parve nakin. Çandekî bi vî şiklê ava dibe û li ser jenerasyonên nû jî vî çandê mayînde dikan. Her wiha ev rewş çanda civakbûyîne dikuje. Ji ber ku mirov, nakevin di nav tekîliyên parvekirinê, ji hevdu qut dibin û tenê dimînin.

Li gor çanda dewlet a li vir mantiqa: “Eger tu parve bikî, tu yê kêmtir bibî û birçî bimîni” heye. Lê di çanda civaka me de baweriya: “Eger tu parve bikî, tuyê zêde bibî û tu ti caran birçî nemîni” heye.

the time is 20:40

Last night a Dutch woman asked me if she have one of my cigarettes. “Of course!”, I replied and handed her my pack. “I have a friend, can I get one for her too?” she asked again. I thought that she understood that by handing her the pack I meant she could take as many as she liked, but she hadn’t. So I replied once again, “Of course you can take one for your friend too.” After taking the cigarettes, the young woman reached for her wallet and said, “I would like to pay for the cigarettes,” adding, “How much are they?” I was shocked and at a loss for words. When I collected myself, I said, “No, I can’t accept money from you for such a thing. I am Kurdish, and in our culture such things have no importance and sharing makes us happy as well”, and so I declined her offer of money. She was clearly surprised by my reply. As if she was witnessing something very strange. I suppose, according to her, my behaviour was bizarre. And for my part, she had made a very strange request... Which one of us was normal and which one of us was strange?

I thought about this question throughout the night, and I can say that I am certain of two things again. One, I appreciated my culture once again. In our culture sharing makes one proud, happy and strong. As it goes against what sharing brings, we don’t share in the name of pride and strength. We share because we want to and we feel like it is in our nature. Those who refuse to share their cigarettes or bread, who don’t welcome their guests, are reproached and seen as cursed. Yet as time passed, our sharing culture changed for the worse and the illness of individualism caught up with our region. But especially in rural regions, in our villages, this culture of sharing still stands strong. I am happy to carry it with me and I won’t give up on its beauty. Hence this is why refusing the young woman’s offer was the right thing to do. I could, however, accept her offer in one respect. In our region, most women are far more economically dependent than men. This may be less visible in the rest of the world in comparison to my region, but the same problem exists in every corner of the world. If a woman friend has a job and wants to pay for our drinks or food, I would happily accept it. They deserve this happiness, and sharing is much more evolved in their nature than in men. When I look back at the woman who wanted to pay for the cigarettes, I think of her request as a right one. Having economic independence and feeling grounded and strong is immensely valuable.

But perhaps there is more to cultural codes and lived intelligence. Europe might appear far ahead in individualism and personal freedoms. But individualism, when based on materiality, detaches us from communality and leaves us isolated. People are nearly imprisoned in the

machines of economies. 'If you can't afford it, you cannot live' becomes the slogan of a life lived within a monetary centrifuge. As capitalism forces this centrifuge everywhere on Earth, in some places people seem to be waking up slowly. But in Europe, unfortunately, it is a cultural conclusion to live by this rule. In Switzerland I encountered it. A lot of elderly people are leaving their inheritance to the state instead of their relatives. I guess they see the state as existing above everything and as reassurance for their children's wellbeing. So they are not sharing it with anyone. And since the state imposes this idea of 'work and protect your earnings and don't share it with anyone or you will starve', children, while wasting their lives with work, end up not sharing their gains with anyone. This forms a culture whereby new generations assure its continuity. Communalism ends up suffering the most. For when not in a sharing relationship, people become isolated.

According to the logic of the state: 'if you share you diminish and starve'. The culture belonging to our society, on the other hand, reassures us that if you share you multiply and never starve.

Saet 20.22

(Kurdish)

Gava îro di qorîdora qampê de dimeşiyam ez rastê zarokan hatim. Li vê derê tiştê herî xweş a ku dixwazim rast bêm helbet ku zarok in! Yek ji yekê şêrîntir heft zorokên keç ji xwe re dilîstin. Ji bo belavkirina serê xwe û hinek be jî ji bo bêhn girtinê li koşekê rûniştim û min li wan temaşe kir.

Zarok dikarin mirov kaşê jiyanek din bikin. Ew jiyan ku em hemû ji nav re derbas bûne û anha jî bêrî dikin...Ew demên ku paqij, bê hîsab, bi coş û me xwe tê de kêfxweş dihîsand ku em êdî nikarin xwe bigihîninê...Ji ber ku piştê zaroktî, li nav kincên sînî ku li me dikin de em vediguherin. Derdorê me bi gerdîşan û bi qaîdeyan tê dorpeçkirin û di nav demê de em dibin êsîrê wî. Piştê demên xwe yên zaroktî, em hêdî hêdî azadiya xwe wenda dikin. Ji ber vê jî dema ku ez zarokekê sêr dikim wek ji van deman tîmê birin û xwe siviktir hîs dikim.

the time is 20:22

Today, while walking in the corridors of the camp, I encountered children. The best thing one can ask to encounter here! Seven girls, all more beautiful than the other, were playing. To distract my busy mind I decided to watch them from the corner.

Children have the power to drag us into a different life. A life that we all long for... To a time when we were happy, naive, spontaneous, joyful... After childhood, we become strangers, weighed down by the heavy and artificial clothes we are put in. After childhood, rules and tradition overwhelm us and force us into submission. After childhood we slowly lose freedom. This is why when I see a child, I am transported into a time before our imprisonment and feel myself lighter.

Saet 18.11

(Kurdish)

Mirovahî kete li nav gunehê mezîna li hemberê xwe. Paktiya xwe wenda kir û efsûna jiyanê xirav bû. Em mêr, bûn sedema vê yekê. Ji ber ku me biryara hikma li ser jina da û xweza ya jiyanê xira kir. Ew enerjî û bedewbûna zaroka qiyemetekî mezîna e ku jin, hîn jî wê qiyemetê wenda nekirine. Me xwest ku hikmê li ser wê qiyemetê bikin û me bi vî xwestekê jî bi xwe, ê xwe qirêj kir. Aniha jî em mêr bê kêf in û hîn jî li pişt xwe girseyên bê kêf dihêlin. Jin, wê dinyayê azad bikin û bi enerjîya xwe yê bi coş wê erd û ezman ji nû ve rengîn bikin! Ji dil û can bawerim, her çiqas ez li wan rojan nebînim jî ev bawerî, min kêfxweş dîke.

the time is 18:11

Humanity committed a grave sin. Lost its naivety and the magic of life was broken. We did this, us men. We decided to suppress women and in doing so went against the nature of life. The beauty and vigour that children possess are also values that women possess. We tried to suppress those values and tainted ourselves in the process. Now we are without happiness and what we leave behind are mere mountains of hopelessness. The world will be saved by women one day, and they will return the colour to our sky and our land with their joyous liveliness! I believe this with all my heart. And even if that time is beyond my own, this belief makes me happy.



Kaldığım kampta İran Azerisi bir arkadaşım var. Kalbi, yüzüne yansıyor. Duru ve hassas...Ortak noktalarımız edebiyat ve paylaşımın gücüne olan inancımız. Sanırım saçma bir cümle kurdum. Çünkü edebiyat varsa zaten paylaşım da vardır. Birbirimizle sohbet etmek iyi geliyor ikimize.

Bugün O'nu dinlerken çok duygulandım ve zorlandım. Boş zamanlarında kendisini dışarı atıp gezen biri ve ben, bu durumu O'nun sosyal biri olmasına bağlıyordum. Ancak bugün anladım ki kendisini dışarı atmasının başka ve önemli bir sebebi var. Aslında kamp atmosferi ve odasından kaçıyor. Çünkü kamptaki odasında sürekli kabuslar görüyor ve zor zamanlar yaşıyor. Bana bugün odasından söz ederken gözyaşları oluk oluk ve kalbinin derinliğinden akıp geldi. Çok acı barındırdığını iç çekişlerinden bile anlayabiliyordum. "Biliyor musun ışıkları açık bırakıyorum sürekli" dedi... Gerisini anlatmasına gerek yoktu zaten, bu cümlenin ardını ben yıllardır biliyordum... Ona uzun uzun sarılmak ve konuşmak istesem de kendimi tuttum ve sustum. Sadece "anlıyorum" demekle yetindim yutkunarak. Çünkü konuşsaydım, söyleyeceklerim O'nun acısını daha da katlayacaktı. Bu yüzden gün boyu içimden söylendim...

Anlıyorum seni. Anlıyorum seni, benim göğsü kabarmış arkadaşım. Anlıyorum biriktirdiklerini akıtamamanın acısını. Anlıyorum kalabalık içerisinden gelip bu mekanda sıkışma duygusunu. Anlıyorum geçmişin kabuslarını hatırlatan bu mekan ve buranın omuzlarına yüklediği ağırlığı. Anlıyorum karanlıklarda yaşadıklarını ve yıllar geçse de ruhunun bir floresan ışığına mahkum kalışını. Anlıyorum ardında bıraktıklarının hüznü ve önündeki yolun muğlaklığı ile depreşen kaygıyı. Anlıyorum seni, benim içi kalabalık ama dışı ıssız olan mülteci arkadaşım...

the time is 23:43

I have an Iranian-Azerbaijani friend at the camp where I am staying. You can read his heart from the look of his face. Pure and delicate. We have some things in common: literature and our trust in sharing. I think these two words don't need to be together in a sentence, since if there is literature there must also be sharing. Our conversations console us both.

Today I got very emotional listening to him. In his spare time he likes to go out on walks; I thought he was just searching for social encounters. But today it hit me. His travels are mere escapes from the camp and his room. He is having nightmares and going through tough times. Today when

he was telling me about his room he burst into tears. His tears were coming from his heart. I could already sense his pain from his sighs. He said, "I am leaving my lights on at all times..." He didn't have to say more. I knew which sentence would follow... I wanted to hold him close and talk to him, but I decided to hold myself back and remain silent. I swallowed two words, 'I know.' I thought more words would only add to his pain. The whole day I muttered those words inside my chest.

I know. I know you, my swollen-hearted friend. I know the pain of not being able to tell. I know how it feels to be trapped in this camp after arriving from lively streets. I know how this place loads its weight on your shoulders, forcing you to endlessly relive the past. I know what you have been through in the dark and how your soul is condemned to fluorescent light. I know how worries are rearing up from a painful past and a vague future. I know you, my refugee friend, crowded inside and outside alone.

Çend roj berê ez û xoşewîst Gluklya me hev nas kir. Hunermendekî xwedî taybetmendî ye. Ew li vê derê dijî. Her çiqaş hîn aliyê wê yên dînîtiyê hebe jî, ew aliyê wê yên dîn, tevgerê rastgo dertîne hole. Ji sedema halên wê yên xwezayî hezkirinek min jê re çêbû. Her wiha ew jî li hemberê min pir durist û bi hurmet e. Li gor min tebîata jinan de enerjîyek wisa asî heye ku ev enerjî ne mimkûne bê dezgîn kirin. Dîwanetî haveyna wan de heye. Ez, ji wan jinên ku vê taybetmendiyên xwe diparêzin hez dikim. Di Gluklyayê de van taybetmendiya dibînim û dibe ku em bibin du hevalên baş.

Îroj min di projeyekî hunerî ya Gluklya de cih girt. Rojnivîskê min hate xwendinê û dema rojnivîs dihat xwendin min jî li enstrûmena xwe ya muzîkê dixist. Di destpêkê û dawiyê bernamê de reqskerekî pir biqabiliyet hebû û ev kes bi muzîka min reqs kir. Ev ji bo min performansekî xweş û bi tam bû. Gluklya, hunermendekî eleqedarê binêhişiyê ye û her wiha dixwaze ku cihana ku di hundirê penaberan de veşartî ye derxe holê û nişanê gelên herêmî bike. Her wiha ev performans ji bo balkişandina penaberiyê bû û min jî bi dil xwestî tê de cih girt. Armanc ew bu ku li ser temaşevan û civaka rewşenbîr de tesîrek bihêle. Ez bawerim derheqê vê armancê de em hinek biserketin. Me hewl da ku li ser profilê zimanê min, bala civakê bi vê mijarê ve bikişînin. Ji bo vê jî min, di aliyek ve performansê hunerî pêşkeş dikir û di aliyek ve jî beşekî halê xwe ya li vê derê nişanê temaşevanan dida. Tiştê ku pevbestin be tune bu. Dikarim bêjim ku her çiqaş performansekî wek hatiye plansazkirin xûya kiribe jî pêşkeşiyek pir xweza û rast bû. Heta ku piştê performansê min xwest ku rûnim û di derheqê têtîliya huner û rastiye de û têtîliya huner û ramanê de binivîsim.

Ew kesên ku bîner bûn wextê performansê hinek xemgîn bûn, lê min qet vê tiştê nedixwest. Herhal sedema xemgîniya wan hîn agahiyên ku di jînenîgariya min de dinivîsiya bû. Halbûkî ew bûyerên-zehmet ê di biyografiya min de dinivîsî û guhdarvana xemgîn kir, di welatê min de van bûyeran bi deh hezaran însên jiyan kir û hîn jî jiyan dike. Min carek din jî fehm kir ku ew êşên em bi deh salane dikişînin û êdî li ser me rûniştî ne ji bo gelên vê derê tesîrek wek şok çêdike. Min pir qiymet da empatî û hewldana wan a ji bo fêmkirinê. Lê min tiştêkî din jî dît ku pê xemgîn bûm; di vê demê de dibê qey em li ser du gerstêrkên cûda de ne û her wiha jiyanên ji hev cûdatir dijîn...

Rojekî xweş bû. Yê ku rojê xweş kir û bêhna min vekir huner bû!.. Her wiha ez kêfxweş bûm ku ji bo penaberan -em bihevre dijîn û şahidê jiyan wan im- tiştêkî biçûk be ji min kir. Ew kesên ku di performansê de bi min re bûn û kesên ku hatibûn ji bo temaşevaniyê mirovên xweş bûn. Nasîna wan û mijûldana bi wan re moral da min. Ez ji xwe haydar bûm ji hebûna hîn kesan ku di nav gelên rojavayê de ne û her tim wijdan û aqilê tînin li ba hev, lê dîsa jî dîtîni û bi hineka re mijûlayî kêfxweşî da min. Spas hevala min a xoşewîst Gluklya û spas huner!..

the time is 23:04

I met dear Gluklya a while back. A unique person, an artist living here. She has a frenetic side that probably nurtures her sincerity. I started to like her and her unique nature. She is incredibly honest and respectful to me. I believe that women, by their very nature, possess an unbridled rebellious energy. Wildness runs in their blood. I appreciate women who cherish this side. I see this in Gluklya too, and I think we two are becoming friends.

Today I took part in an art project of hers. A portion of my diary was read out loud while accompanied by an instrument I played. The beginning and the finale were led by a very talented dancer who danced to my music. From my perspective, it was a very pleasant performance. Gluklya has an interest in the subconscious, and she uses this interest to focus on the inner worlds of the refugees. I wanted to present a small piece that was gripping and affecting for the refugees. And I think we succeeded to a degree. We tried to tell it from my perspective and my language, intersecting an artistic performance with a section from what my status here means. Nothing was fictional. It might have appeared as a designed performance, but it was natural, a real presentation. After today's performance, I wanted to write on the relation between art and reality, art and thought.

The viewers lamented a little which wasn't my intention. I think it was caused by the inclusion of some sad points in my biography, although we didn't see the harm in it. The outlines of my life story are shared by tens of thousands of people in my country. Now I have understood once more the pain we bared throughout the past decades, and to become accustomed to it is still shocking for people here. Their attempt to empathise is the most valuable thing for me. But there is another thing I recognise: even today it feels like we are on separate planets living separate lives, and witnessing this separateness is incredibly saddening.

It was a beautiful day. What made it beautiful and made it breathe was art! It made me happy to know I did something, even small, for the refugees I have been living with. The people who came to see the performance were lovely. It lifts my spirits to meet and converse with them. I was aware of certain people in Western society who speak of conscience and mind in the same breath, and to have conversations with some of them brought me happiness. Thank you my dear friend and beautiful woman, Gluklya, and thank you art!

Saet 13.53

(Kurdish)

Li ser hêzdarî û bêhêzî

Yên ku serdest an jî desthilat in, berê her tiştê çand û zimanê xwe belav dikin. Ji ber ku desthilatî ya herî mezin di nav serê însên de ava dibe. Desthilatdar li gora xwe tîgîn û zîhniyetekî dihûnin. Bi girêdayê vê carnana hewl didin ku zagonên xweza bi sekna xwe ve girê bidin û rewşa xwe watedar bikin. Ji van zagonan ya herî pêş jî li ser tîgînên hêzdarî û bêhêzî ava dibe. Tê gotin ku kesên ku hêzdarin, bedenê bêhêza ji xwe re dikin pêlîng û bi vî şiklê asta xwe bilind dikin. Her wiha ev wek zagonekî xwezayê tê dîtîni û bi seleksiyana xwezayî ve tê girêdan. "Ger ku dixwazî bijî, hewceye ku xwe ji bêhêzan xilas bikî. Ger ku dixwazî bijî, hewceye ku hemû dijberên xwe tîk bibî û her wiha ji herkesê hêzdartir bibî". Birdozî ya dewletê bi ser vê çandê ava dibe. Ji bo vê jî hewceye ku dewlet, ji artêşê heya aboriyê bi hêz be û hemû civak hewceye ku li ber dewletê -hêza herî mezin- de stûyê xwe xwar bike. Hemû jin, dijber, karker, hunermend, kesên ku dixwînin û dikarin gotina bînin zimên, kesên ku bi raman, bawerî û berpêbûnên zayendiyên cûda ne. Bi kurtasî hemû kesên ku potansiyela cûdahiyê di xwe de dihewîne û ên di nava van sînoran de dijîn. Ji ber ku ev kesana wek yê hundirîn tîni dîtîni û li gor desthilatdarî ev kesana dixwazî hêza dewletê puç bikin. Çi heyfe ku kesên li gor vê çandê şikil girtine jî hêza dewletê wek teqez qebûl dikin û li gor vê tevdigerin. Heta carnana hîn

kesên ku qaşo rexnedarin, muxalifin jî hêza dewletê pir mezin dikin û her wiha hêza xwe ferq nakin.

Halbûkî ev derevekî pir mezin e. Ji ber ku tarîfên van herdû têgînan jî ne rast e. Wekî mînak, tu carî diktatorekî da ku hemû zagon û çek li destê wî de ye, li hemberê hunermendekî ku destê wê de tenê gîtar an jî firçeyek hebe de ne bi hêztir e. An jî em mêr, bi hezar salanê ku li ser jinan zilmê dikin, lê em tu carî qasê jinan bihêz nebûn û emê nebin jî. Ji ber ku jin, bi tirûşin ku ev hêjayê hemû arteşan, lê em mêr, bi rewşa xwe yê îtaetkar arteşan ava dikin û bi van arteşan jî hewl didin ku hêza jinan bişkînin... Tenê çekên destê nêçîrvanek wî tu carî ji şêrekî an jî ji çivîkekî bi hêztir nake.

Ji ber vê yekê hêz çî ye? An jî hêzdar kînin? Ez bawerim hewcedariya me ji nû ve xwendina van pirsan heye. Li gor min tiştê ku hêzê derdixe holê çendanî nîne, wesf e. Ew tiştên ku di bin navê hêzê de nîşanê me didin, rastî ya xwe de bes paravanên kartonin ji bo veşartina heqîqetê. Eger ku em hêza xwe ferq bikin û bikaribin destê xwe bavêjên li van paravanan, wê emê xwe bigihînin azadiya ku di piştê veşartî ye. Ji bo vê jî berê her tiştê hewceye ku em xwe ji tarza fikrandin û têgînan desthilatdaran azad bikin. Tenê em bi vî şiklê dikarin bi objektîf binêrin û her wiha wateya hêzdarî û bêhêzî fêm bikin.

the time is 13:53

## On Powerfulness and Weakness

The Sovereign or the rulers create their own cultures and propagate their own language, for the mightiest ruler is the one inhabiting the human mind. Accordingly, a set of notions is established from which weaves an ethos. In this context they associate their positions with nature's rules; one being the notion of powerfulness and weakness. That the bodies of the weak can be used as upward steps for the powerful is seen as a natural law, referring to natural selection as its basis. Hence the state must be powered, from its economy to its army. And all sections of society must obey the largest power: the state. Dissidents, women, workers, artists, the educated who are able to speak their minds, people from different beliefs, thoughts and sexual orientations. In short, all the ones possessing a potential for difference. And everything is organised in line with its relation to power and weakness.

However, this is completely a lie. Because how these notions are defined is inaccurate. For instance, a dictator with control over the law and armed forces can never be more powerful than an artist holding a guitar or a brush. Otherwise, us men will never possess the same power

as the women we have tyrannised. Because while women possess within themselves a power worth armies, us men, with our dutifulness, built armies against them. A hunter is never stronger than a lion or a bird just by holding an armed weapon.

Accordingly, the questions of 'What is power?' or 'Who is powerful?' should be asked in reverse. I think what determines power is not quantity but quality. And what we see is only a cardboard screen covering the truth. Our freedom is behind that screen. In short, and for the most part, we need to strip our minds of the state-instituted presumption of otherness and instead begin to develop a more powerful connection to meaning.

Saet 21.32

(Kurdish)

Însên, bi vîna xwe tê wateyekî. Ji ber ku bûyîna xwedî vîn, mirov bi serbixwe û azad dike. Her sekna bi vîn, tê wateya tercîhên bihêz. Lê her tercîh nayê wateya sekna bi vîn. Vîn, hevparîbûna giyan, beden û raman e. Lê tercîh, berpêbûna tenê xwestekên giyan, raman an jî bedenê ye. Û carnî jî berpêbûnên an jî xwestekên bêpîrs in. Wekî mînak, biryardayîna derheqê xwekirina qazaxekî rojane û hîlbijartina rengê wî, bes berpêbûnekî şiklî zayendî ye. Lê biryara guherandina hemû tarz û elimandina xwekirinê, tercîhekî bi vîn e. Ji ber ku jî bêjînga giyan, beden û ramanê derbas dibe. Ya yekem tiştê rojane, seranser û sivik e, lê ya duyem tercîhekî bi wesf û bi tesîr e. Her çiqas bi kar anîna vîn êdî ketibe astekî pir mutewazî jî, dîsa jî bi kar anîna vîn, her însanê kêfxweş dike.

Bijartina penaber bûyin, tercîhekî mecbûrî ye. Mecbûriyetek ji bo jiyankirin, têr bûyin, stîrinê ye û her wiha ji destê êsirtiyê revînekî mecbûrî ye. Revîn, kêfxweşî nade tu kesî. Wek ku çivîkekî hêlîna wê hatibe xerav kirin û baskên xwe bi êş li hevdû bixe... Hemû merheleyên ku penaber jî hundirê wî derbas dibin û her wiha dema ew hîn li welatê xwe de ne muameleyên ku bi wan tên kirin, şiklê şikandina vînê ye. Ji bo kesên mecbûr mane ku tercîha penaberiyê bikin û her wiha bixwazin ku di nav arî de dîsa bi xwe ve bên, êdî jî wan re dîwarên bilind hene. Ji bo vê jî seknekî bi vînê û jî bo jiyaneke nû baskê xwe hevdû xistin, hema hema bê îmkan e. Di nav sînorê hatî zelal kirin û qaîdeyan de bedêla tercîhên mecbûrî tê kişandin. Penaberî, wendakirina sekna bi vîn û qabîliyeta guherandinê ye. Penaberî, ne berpêbûnek sivik û ne jî biryarbûnek bi vîn e. Di navbera arî yê pişt û diwarên pêşî de rewşekî asê bûn e...

the time is 21:32

A person reaches meaning through will. Because will enables independence and freedom. Each intention brings strong decisions. Yet each decision doesn't necessarily contain intention. Intention comes into being within a harmony of body, mind and soul. Yet decisions are leanings towards a demand of the body, mind or soul. Often an inclination without questioning. For instance, the decision of which colour sweater to wear is often solely based on gender, hence it is stylistic. But changing one's dressing habits completely is an administrative task that requires the filters of mind, thought and soul. The latter being daily, superficial and on the surface, and the other manifesting itself as a determined and effective choice. The use of will may boil down to prudent scales, yet once used it still makes one happy.

To choose to be a refugee is an imperative. A compulsory escape to live, to be fed, to take shelter, to not be a prisoner... Escapes don't make people happy. Just like a bird flapping its wings in grief after its nest burned down... With every step that a refugee takes, the treatment they receive at each stop is a decimation of their will. The ones who desire to be reborn from this forced choice, to be reborn from their ashes, now face walls. It becomes nearly impossible to have any will and to fly off to a new life. One can only endure what is determined for them between borders and regulations. Thus, being a refugee is to truly lose the power to change things with will. It is not an orientation, nor a voluntary decision. Being a refugee is an incarceration between the ashes left behind and the walls still ahead.

Saet 00.58

(Kurdish)

Bi rengê bask û bedena min nexape xerîbo. Tenî ya şewatan daket ser min. Dema mirov baz bide û nekarîbe li pişta xwe binêre û aliyekî din de jî hemû danehevên mirov bişewite, êş nasekine. Bi ku de biçî jî ew êş te mecbûr dihêle ku bi tenî û arî re bijî.

Hey, tu xerîbo! Tu qet bûyî şahidê şewata danehevên xwe? Te qet qîjîna wêneyên ku dişewitîn bihîst? An jî qet bîranînên te yên ku bi rûyên xwe yên şewitî digerin çêbûn?

Bi rengê bask û bedena min nexape xerîbo. Anha her çiqas bişibim şevşevokê reş jî di hundirê min de perperokê rengîn heye.

the time is 00:58

Stranger, don't be deceived by the colour of my wings or skin. The soot of many fires has collected over me. As everything you accumulated in life burns, running away without looking back doesn't ease any pain and instead forces you to exist amongst ashes.

Hey, stranger! Have you witnessed the burning of everything you accumulated in life? Have you heard each photograph scream? Or are the faces of your parading memories burned?

Don't be deceived by the colour of my wings or skin, stranger. I may look like a black bat, but inside there is a colourful butterfly.

saat 17:37

(Turkish)

### Post Diktatörlük

İnsanlar, burada posta kutularıyla yaşamak zorundalar. Buna post diktatörlük diyorum ben. Her sabah ve her akşam posta kutularına bakma zorunluluğu nasıl tanımlanabilir ki başka? Çağımızın kutsal ibadetgahları gibi bu kutular. Ne bakışların ışıltısı var ne de kalbin sıcaklığı... Her sabah ve her akşam aksatılmadan bir ritüel gerçekleşiyor. Gönülsüz selam veriliyor, zorunlu askerlik yapan insanlar gibi. Sabah ve akşam tek mil veren emir komuta yığınları. Bir posta kutusu ve içindeki kağıtlara bağımlı kılınıyor insanlar. Mektuplar, ruhsuz kelimelerle dolu. Rakamlar ve talimatlar var sadece. Düzgün cümleler ile bozguna uğrattılıyor hayat... Daha fazla harcama ve rahatlık vadeden renkli banka kağıtları ile ödeme ve uyarı eksenli, soğuk-brokratik talimatlar.

Ve devlet denilen Leviathan

kağıtlarla hükmediyor artık.

Ateşten toplara gerek duymadan...

the time is 17.37

### Post-Dictatorship

People are forced to live with their postboxes here. I call this post-dictatorship. How else can I define the urgency to check their postboxes twice a day? These boxes are modern-day sanctuaries. Yet without a sparkle in their gaze or warmth in their heart... Every morning and

every night a ritual religiously takes place. They greet reluctantly, as if completing compulsory military service. Stacks of commanders give an oral report day and night. People are subjected to a box and the paper it contains. Letters are full of soulless words, only numbers and instructions. Life is put to rout with unruffled sentences. Colourful bank statements promising future expenses and comfort. Bureaucratic instructions sitting atop the axis between payments and notices.

And the leviathan called the state  
Now rules with papers.  
Without the need for fiery cannons...

Saet 02.02

(Kurdish)

Montaigne dibêje ku “Mirov, hemû halên mirovatîyê di xwe de dihewîne”. Mirov di encamê lihevxiştina karekterên ontolojîk -da ku bi xwe de dihewîne- dibe xwedîyê nasnameyekî. Ev demana jî bi êşin û di nav xwe de gelek xeletî û emelên çewt dihewînin. Zayîna mirov an jî çêbûna mirov, piştê xeletiyên gengaz dibe. Ji bo kesên ku xwedî lêpîrs, bi mereq û bi derdê heqîqet û wate, tucar melûmat an jî agahiyên zûha têr nayê. Dixwaze ku bi jiyankirin û bi tamkirinê xwe bigêhîne rastiye. Ji bo vê yekê jî pêdivîyê wî bi kirina xeletiyên heye û tam jî li vê derê pênasiya azadiyê derdikeve holê. Li gor min azadî, di derheqê xeletiyên de bêtirsbûyîn e.

Ew kesên ku dibe penaber, pêgirtiyên mafên bi sinor e û ji bo van mafan wenda neke jî mecbûre ku bi hin rêzikan re bijî. Ji bo penaberekî xeletiyek tê wateya paşveçûyînek bêtelafiyê. Yek xeletiyekî tenê dibe sedema giranbûna rewşa wendakirina aboriyê û tengbûyîna sînorên tevgeriyê. Ji bo vê yekê jî penaber, her tim di dûlêr/kendalê de dijî. Ev dûlêr/kendal, di navbera tiştên tîne ziman û tiştên dixwaze lê nikare bîne ziman de disekine. Êdî jî bo kesên ku dibe penaber, rengê şîn ne li ezmanan de ye. Ji bo wê şîn, di bêrika wî de ye. Ji ber ku ew nasnameya jî bo sekinandina wê welatê hatiye dayîn di rengê şînê de ye û her tim mecbûre ku wê nasnameyê bi xwe re bigerîn e. Li gor min penaberî, ji bo neketina xeletiyek her tim bi tirs jiyankirin e. Û jî bo vê yekê jî penaberî, wendakirina azadiyê ye.

the time is 02:02

“Every man has within himself the entire human condition”, says Montaigne. Every person gains their identity through this war of

ontological characters. These are painful processes harbouring the praxis of mistakes. What we call a human being arises from its mistakes. Especially for those who seek truth and meaning in things with curiosity, slivers of information are never enough. They aim to reach a truth by questioning and tasting things. For this they need to make mistakes, and for me this is exactly the place to come to a definition of freedom. To me freedom is to not fear making mistakes...

A refugee person is subjected to the limited freedom given to them and is obliged to live obeying certain regulations so as to not lose these freedoms. Making mistakes means regression that is hard to compensate. Making mistakes means heavier conditions, economic loss and a decreased range of motion. Hence, a cliff hangs between what they say and what they mean. For a refugee, blue's meaning changes from the sky to an identity card in their pockets. To me, being a refugee is the fear of making mistakes and losing all freedom...

Saet 02.10

(Kurdish)

Min îroj destûra mafê rûniştandinê hilda. Nola barekî giran ku li ser milên min rabû be. Ew giranî ya ku li ser min de da ku nedihat tehmûl kirin ji rûyê sekinandinê bû. Min xwe wek di nav çemberekî de mame de hîs dikir. Êşa derketina ji welêt, her wiha êşa dûrbuyîna ji malbat û hezkiriyên ji xwe giran bû jî bo min. Li ser van êşan de sekinandina jî bo iqame girtinê jî yek caran min teng dikir. Lê anha wek hinekî sivik bûme. Ji vir şûnde wê çî derkeve pêşiya min nizamim lê hinek be jî pêşveçûnek ku min kêfxweş kir derket pêşiya min.

Vê êvarê dirêj meşiyam. Min paşeroja xwe fikirî. Ew demên ku min jî bo azadiya gelê xwe û jî hemû mirovatîyê re jiyaneke bi heqaniyet dixwest û jî bo vê jî bi kelecax xebata ku min dikir. Her wiha van demên xwe yê ku jî bo biryara iqametê kêfxweş dibim jî fikirîm. Û min paşeroja xwe û aniha da berhev. Rewşekî xerib e. Ez jî xwe pîrsîm, gelo xeyalên min biçûk bûne an jî ev, encama derûniya di nav dorbêç de mayîne? Şert û mercên ku mirov tê de jiyandî, li ser fikrandin û ramanê mirov pir tesîr dike. Lê mirov, xwe li gor her şert û mercan jî lê tîne û lê tehmûl dike. Ev destûra/ biryara iqamê, helbet jî bo bi rihetî bigerim û biafirînim pir girîng e. Lê ev destûra iqamê, li cem xeyal û hêcanê min de pir sivik dimînin. Ji bo min bes destûrek sivik û karekî burokratîk e. Ez destûr nadim ku ev biryar, li ser min hikm bike û her wiha xeyalên min bi sînor bihêle. Ez nikarim dinya xwe biçûk bikim.

the time is 02:10

Today I received my residence permit. I feel a weight lifted off my shoulders. There was the unbearable heaviness of waiting. I felt trapped inside a circle. Now I feel a little relieved. I don't know what I will face next, but alongside the burden of leaving my country, being far from my family and loved ones, having to wait for the residence permit was too much. And now, despite all the pain, something happened to make me slightly happy.

I walked for a long time tonight. Thought about my past. I compared the excitement of working for the freedom of my people, in order to further the freedom of all humanity to live in a just world, and the happiness I felt when I received the residence permit. An odd position. I wondered if my dreams had shrunk or if it is just the psychology of being trapped. One's world of thought is heavily affected by the conditions of life. But one adapts to any condition so as to endure. Surely, this residence permit is crucial to being mobile and productive. Yet in comparison to my dreams and my excitement for life it is just a simple bureaucratic process. I can't allow it to rule over me and diminish my dreams. I won't shrink my world.

Saet 02.19

(Kurdish)

Berkenîbûn...

Mirov, bi xercekî ji qaîde, kevneşop û ji ajoyan tê dûtin. Ev xerç, bi derbasbûyîna salan ziwa dibe û bi xwe re çermê jî hişk dike. Bi taybetî jî ew gulpikên li rû de ziwa dike. Her wiha hin kulîlkên li bedena mirov de veşartî û dixwazin ku aj bidin jî bi bihurandîna demê ve ziwa dibin. Ji ber ku ji rojê mehrûm in û her wiha ji sedema perdeyên li ser çavên mirov de nayên dîtîn. Lê belê kulîlkekî renaheng û mezin ya dil heye. Xwediyê bedewbûnekî wisa ye ku wek dayika hemû kulîlkan e. Ev kulîlk, dema fersend bibîne xwe davê derve û rûyê xwe nîşanê me dide. Dema em kesekî rûken bibînin, wê emê wê kulîlkê bibînin.

Li ku derê û kê dibe bila bibe, dema kesekî dikene dibînim, di rûyê min de jî kenekî dertê holê. Hela ku jinekî bikene, jîyan bi şiklekî cûda bi min dixûye. Kena zarokan jî paqijî û saftiyê tîne bîra mirov... Carnan qerekerên nebaş -piraniya wan mêrin- di televîzyonê de dibînim ku dikenin (diz, kesên ku ji bo nift û erkê şer derdixin, key, dîktator) di hundirê xwe de ji wan re çêra dikim. Lê ferq dikim ku bi rûkenî çêra dikim û ji bo vê yekê jî ji xwe re hêrs dibim. Ji ber ku ew kesana qerekerê zalim in û rûkeniyê heq nakin. Lê hêza kenê wisa ye ku li ser min hikm dike. Herhal sêhrekî kenê

heye ku dikare hemû nêrînin politik têk bibe. Li gor min berkenîbûn, ji înyada zirxa bedenê vebûna kulîlka dil e.

Li vê derê, ev axên ku ez têde mişextî me min wateyekî nû ya berkenîbûnê keş kir. Min ferq kir ku penaberên li vê derê, dema bi rêvebirekî qampê re diaxivin an jî derdikevin li nav bajêr her tim bi rûken in. Ev hal, wek dîmenekî xweş bi min hat û şahidiya vê pozitîfîbûnê min kêfxweş kir. Bi taybetî jî naxwazim ku ew kesên heremî, penabera wek kesên mehdîrîş bizanin. Lê dema min bala xwe da van halên rûkenî, sedema asil da ku di bin rûkeniyê de veşartî ye min ferq kir. Ew kenên penabera ji hundirê wan nedihat û her wiha sedema kenên wan ji vekirina kulîlkên dil jî nebû. Wan hewl dida ku ew hestên xwe yê pelçiqî veşêrin. Ji ber ku piraniyê wan ziman nedizanî û nedikarîbûn xwe baş îfade bikin. Ji ber ku piraniyê wan xwediyê azadiya aborî nebûn û aliyê aborî de mecbûrê alîkariya dewletê bûn. Her çiqas ew alîkariya ji dewletê dihat pir tiştek bê qiymet be jî hewcedariya penabera bi vî alîkariyê hebû. Ji xeynê van sedeman, piraniya penaberan dizanîbûn ku gelên ku li van deran dijîn penaberan wek barekî dibînin. Piraniya penaberan dizanîbûn ku êdî hêlînekî wanê bikaribin dîsa veşêrin tune ye û di nav halekî muhtac de ne. Vî rastiyê bi êş hîs dikirin. Ji bo vê jî wek dil şikestî û pelçiqî hîs dikirin. Û hewl didan ku ew hestên pelçiqî bi rûkeniyê biveşêrin.

Min fehm kir ku penaberî, berkenîbûnê derewîn in...

the time is 02:19

To Smile...

